


pîne

AŞTÎ DI BIN LINGÊ DAYIKAN DE YE!

KOVARA QERFÎ Û WÊJEWÎ



kovara qerfî û wêjeyî ya nîv mehî

1-16 eylül (rezber) 2000

Sayı: 21

500.000 TL



TIRKIYE EV SERÊ 80 SALAN E DIBÊJE, "LI CÎHANÊ AŞTÎ LI WELÊT AŞTÎ" LÊ HÎNA JÎ AŞTÎ Û ARAMÎ PÊK NEHATIYE. JI BER MAYÎNÊN ŞER GELEK MIROVAN JIYANA JI XWE DEST DA Û HÊ JÎ DIDIN. DEWLET LI ŞÛNA KU TEVDÎRAN BISTÎNE, MAXDÛRAN SUCDAR DIKE: HEM DIZ E, HEM TOPIZ EI.. LÊ DIVÊ PÊŞÎN DEWLET, MAYÎNÊN NAV XWE PAQIJ BIKE...



ROJA WE AŞTIYÊ PÎROZ BE!.. TE ÎRO JI BO AŞTIYÊ ÇI KIRI!..

GUNDEK ÇAWA DİMIRE!..

Berê, dema erebeyek li ser riya gund xuya dibû, mirov tavilê, li serbanê xaniyên ku rê didîtin, kom dibûn. Lê niha mirov naçin cem erebayan jî...

Li gundê (min) Malên Bûtan, niha bêdengiya goristanan, strî û kal û pîrê ku bi tena serê xwe dijîn, hene. Kal û pîrên ku li ber qêrîn û aciziya zarokan gêj dibûn, niha li goristana zindiyan in. Strî û giyayên ku, berê, gundiyan li çiyayên gund (**Nurheq, Salawan**) peyda dikir, niha li nav gund, li ser şiverê û cilxian pişkiwîne û moz dikin!.. Êdî li gund dengê zengilan jî nayê, lê pez heyê!..

Xemla û rewşa gundan ango tamarên xwînê yên gundan, şiverê û cilxî li ber windabûnê ne. Berê çaxê te li çiyê mêzê dikir, şiverêyên çiya û deştê, wekî marekî şox û şeng, xwe li ba dikir!.. Li gelek gundê **Elbistanê** (Malên Xane, Kullî, Zerdekeş, Axçasar, Qereçar, Qopan, Kaniyê Dizan, Nergele, Çutlîk hwd.) rewş û hal kêm û zêde wisa ye!..

Piraniya gundiyan berê xwe daye **Xopana Ewrûpayê!** Jixwe li gelek bajarên Ewrûpayê Elbistanê wekî welatekî zanin!.. (Her çend her kurd vê yekê li ser bajarê xwe dibêje jî, lê bêhtir li Elbistanê dikeve! Navê wê jî lê dikeve!..) Li gundê ku berê her kesî bi keviran tahareta xwe dikir, niha tişî selpak û qûnmal e!..

Li aliyê din, havînê kolanê Elbistanê dibin wekî podyûmê **Parîsê!**.. Plaqeyên "yerlî" li ber çavan nakevin!.. Kesên ku tafla xwe li gundê xwe derbas dikin, ne hindik in.

Berî her tiştî li gund "dengê jiyane" ango dengê zarokan kêmbûye. Berê xwediyê baxçe û rezên gund, ji ber diziya zarokan top diavêt û bi zarokan nedikarî!.. (Dev ji gundê me berdî, me berê xwe didan gundê cîran jî.. Bila kes nebi-hîze...!) Vêsta (niha) hewîn û sebra wan nayê, bêriya zarokên berê dikin!..

Berê dema otobusa di (gund) diçû bajêr, zarokan heya danê êvarê li bin siya darê otobas dipa. Çaxê ku otobus xuya dibû, daketin ser rê, xwe diavêtin pişt otobusê heya gund dihatin. Di vê navê jî şofêr bi têra xwe şor û çêr jî dixwarin!.. Lê wekî canbazan bûn... Zarokan "**cûmê qanikan** (kenger sakızı)" çêdikir û bi vî awayî dest bi tîcaretê dikir.

Berê "**maçê gundan**" çêdibûn. Heyecan û kondîsyona ku li van maç û tiratan peyda dibû, li tu maçan peyda nedibû. Bi serê heq, kes nedwestiya û ku top li ku bû, her kes li wê derê bû! Lîbero, santrafor tunebû. Li sahaya gundê me, çaxê top diçû tacê, em nîv seatê li hêviya wê dekin!.. Ji ber ku sahaya me hema bêje, li qûntara çiyê bû, lê ji me re wekî **Munîh Olîmپیyat Stadi** bû!..

Dema xort ji bo maçê diçûn gundekî, keçên wî gundî satilên xwe yê tişî vala dikirin û dihatin ser kaniyê!.. Xêr bû?..

Û em hatin ser kurdiya Elbistan û Meraşê!.. Îro li Elbistanê ciwanên ku li ser zimên disekin, hêdî hêdî zêde dibin! Li goristana hin gundan kêla hin goran bi kurdi hatiyê nivîsîn (*Kuro xelk bila bi zimanê we bikene, qet xeman nekin!.. Bila haya we jê hebe Zanîngeha Bogaziçiyê li ser kurdiya we dişixule!.. Teybekê hilgirin her tiştî qeyd bikin!.. De zû!..*)

RZO - DIZO

İMAM cici





DOZO

BİRECAN



ŞEKİRÊ QULQULÎ

Cem Şeker



ŞAŞAŞA


Şaxa İHD'yê ya Amedê cardin vebû, lê piştî nîv saetê hate girtin.




Dewletê xebata zarokên kolanan qedexe kir. An jî li cihê ku avzêlkê zuva bike pêşyan dikuje




Tirkiye bêhemdî xwe Zozana Lolan wekî qampa PKK bombe kir (!!), lê hê jî li xwe mikur nayê.



WEYLİ MİN!.. BALAFİRA TIRKAN!..



Her çiqas Ecewît li cem MGK'ê giliya Ahmet Necdet Sezer kir jî biryarnameya li ser memûran nehate qebûlkin.




Suryanî-Asuriyan jî ji bo statûya hindikahiyê serî li Yekîtiya Ewropayê da.



Dewletê ji bo ku li dijî Cinawirê Enflasyonê kar bikin, ji bo zarokan pirtûkek amade kir.





Qetliama mayinan didome, lê dewlet dengê xwe nake.



Derbarê nivîskarê pirtûka bi navê İbrahim Kaypakkaya, Turan Feyzioğlu doz hate vekirin.





ZIGGS
 muratbatgi@hotmail.com
MURAD BATGI
GUHERÎM, GUHERÎN, GUHERÎ...

Dema peyvek pir têt bikaranîn, piştî demekê ev peyv di devê me de dibe benîşt û em demekê vê peyvê dicûn û davêjin. Van rojan jî guherîn bûye benîştê ser zimanan. Heke hûn ligel hemû israrên nikarin xwe biguherînin, guh bidin pêşniyazên Pîneçiyar, da ku mala we mîrat bibe û ji binî ve bişewite.

* Ji bo guherîna we gava yekem, satelîta xwe ya Medya TV'yê di cih de bifiroşin û pê pereyê wê bibîne aboneyê CINE 5 û Tele ON'ê û li gorî dilê xwe li filman temaşe bikin.

* Dev ji guhdarkirina stranên Şakiro, Gerabêtê Xaço, Ciwan Haco, Koma Amed, Koma Çiya, Şivan Perwer û hwd. din berdin, herin li Tarkan, Mustafa Sandal, Hulya Avşar, Sibel Can û İzzet Altınmeşe guhdarî bikin.

* Dev ji xwendina rojnameyên kurdî û yên ku kurd derdixin berdin, herin rojname û kovarên wekî **Asabî, Milli Görüş, Playboy, Star** û hwd bikin.

* Tew Pîne divê ji deriyê mala we û saziya we jî nekeve hundir!..

* Di şûna dîwanên Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî de, çîrokên Dede Korkut ji ber bikin. Di şûna **Mem û Zînê** de **Romeo û Juliet** bixwînin.

* Divê hûn gaveke zûtir ji HADEP'ê jî îstîfa bikin û yekser bikevine partiya **Besîm Tibûk**. (Besîm Tibûk kî ye?) Ez çî zanim Besim Tibûk kî ye!?

* Divê hunermend û şanogerên NÇM'ê di cih de stran û îstîkên xwe wergerînin tirkî yan jî farisî û erebî.

* Divê ciwanên me êdî civînên xwe di odayên teng de nekin, di bîraxaneyên fireh de civîn û kokteylan çêkin.

* Divê her ciwanekî/e me sê caran bizewice û çar caran telaq bavêje!..

* Divê her kes rewşa **Fenerbahçe** û **Galatasarayê** bi baldarî bişopîne û here maçên wan.

Êdî me jî fêhm kir ku bi jiyana kurdî û bi zimanê kurdî guherîn çênabe... Ji ber wê divê hûn ji serî heya binî xwe biguherînin. Nokên me hatine bajêr divê bibin leblebî... Ku hûn nebin leblebî hûnê bibin hebhe-bî...

Gelo hûn van tiştan pêk bînin, hûnê bibine kurdekî/e baş? Nizanim!... Têrê nake bavê min têrê nake!..

Ji bo ku em baş pê bawer bin, guherîneke fizîkî jî divê ji bo we... Ji hêla fizîkî ve gelo hûnê xwe çawa biguherînin? Mesela hûn dikarin ji pozê xwe dest pê bikin? Hûn dikarin pozê xwe pênc cm. dirêj bikin? Piştî ku we pozê xwe dirêj kir, divê hûn guhê xwe jî kêmtir bi qasî pênc cm. dirêj bikin. Hûn porê xwe şîn bikin, wê guherîna we xwe baştir bide der. Wekî din jî hûn îçlikê xwe li lingê xwe û pantorê xwe li milê xwe bikin, em dê bibînin ku guherînek di jiyana we de pêk hatiye. Heta hûn dikarin destekî û lingekî jî bi estetîk ameliyatekî li xwe zêde bikin. Îtîmaleke mezin mirovekî bi sê lîngan û sê destan wê gelek balê bikişîne!.. Mesela hûn dikarin zivistanê bi şort û havînê bi şelwar bigerin û herine ber behrê.

Heke hûn bi qûna xwe bawer in biguherin. Xwedê me ji hiş û aqil neke...


Hinek ji me dixwazin biguherin, hinek jî dixwazin biguherin.. Em dixwazin biguherin.

EZING

Esref MUMCU

NA ABÊ, ME GOT SÊ ÇEWAL GENIM
KILOYA WÎ 500 E, LÊ TU HÊ JÎ
DIBÊ 350!.. NA ABÊ, XELAS
NAKE!..

ME DEH CARAN GOT,
LI DAWET Û DÎLANÊ
TELEFONÊ DESTAN
BIGIRIN! LÊ EV QEBRAX
ME DIXE CIHÊ KERAN!..



HIN TÊKILINÊN FELSEFÎ, QUZILQURT
Û KERATÎ

MERHEBA HEVALÊ GUNDÎ EZ DIXWAZIM
BI TE RE LI SER FELSEFÊ BIAXINIM!..
BI DÎTINA TE, NIÇE NIHÎLÎST BÛ AN
EGZÎNYANTALÎST BÛ? Û HER WIHA
ONTOLOJÎ, EPÎSTOLOMOJÎ ÇI YE?
PLATON ÇI GOTIYE...



DERZIYA MIN QUL, DERZIYA DIYA MIN QUL,
DERZIYA MIN DI QULA DERZIYA DIYA MIN DE,
KA TU BÊJÎ!..

ERRIK!.. EV TIŞTEKÎ
GELEKÎ BALKÊŞE!..



DERZIYA MIN QUL, DERZIYA DIYA MIN
QUL, DERZIYA MIN DI QULA DIYA
MIN DE...

WEY LAWÔ, QULA DÊ JI KU
DERKET! HAWAR LI MIN!..



TE XWAR
FELSEFECÎ!..

WEY BI QURBANA BILIK Û CÛCIKÊ TE
BIM KURO!.. BI ŞEREF BABLEKAN
DILÎZE JINÊ!.. ERRIK... ÇAVÊ MIN
XWE ÇI SOSRET DIHEJÎNE!..

KURO TU ÇI ZANI!..
BI XWEDÊ, BI ŞEREZDÎN
DILÎZE!.. KA LI DENGÊ
WÎ GUHDARÎ BIKE!..



DÊLIK... FORQÊ MIN BIHÎST KU
TE MÊR ANÊTNE MALÊ!.. ZÛ
BÊJE, TE EW LI KU VEŞART
QEHPIK!..



NA ÊHSO NA!.. EZ TE NADIM MALÊ DINÊ!.. KU EZ
DEREWAN DIKIM, BILA FERHENGÂ ZANA FARQÎNÎ
LI SER ÇAV, DIL Û SERÊ MIN BIKEVE!..

~ NIFIRÊN DIYA MIN ~
EŞO LAWÔ, MARÊ MIRÎ BITE
VE DE!.. *
TU DI GOLA BÊ AV DE BIFETISÎ!
*
MIN JI HAWARÂ XWEDÊ, GOSTÊ TE
BIKIN TÛRIK, BÎNIN BER DERT!..

DOXTOR BEG, VÊ ÊŞA
DIRAN, ÎMANA MIN
ÇIKAND!..

LAWO TC ÇI ANIYE SERÊ KURDAN!..
XALO NE HEWICEYE TU XWE EVOQAS
TAZÎ BIKÎ!.. EZ NE DOXTORÊ
KÎR Û QÛNÊ ME!.. EZ DIRANKÊŞIM.
HÊRE TU BESUCÎ!.. TE HEYA ÎRO
DOXTOR NEDITIYE!..



MEMIKÊ YARÊ LI SER DEVE'M
COT KANÎNEE.. ♪♪♪



TEW TEW... TU DIBÊ QEY ERD Û EZMAN
WÎ GÊKIRNE!.. KURO KU EZ NE KINIK
BÛMA, MINÊ BIKUTA WÊ, LÊ HÛN
DU HEBIN, LOMA DITIRSIM!..

ÇEND DÎMEN JI "KOMARA TELEVOLE"!!!

Demokrasî

Li gorî fikir û ramanên zindiyên, li ber dadgeh, qereqol û zindanan têtî firotin. Li gorî zagonên 12'ê Rezberê, yê/a ku li îşkencexaneyên serbixwe, sertîfîka "Netekîm" zû bi zû wergire û bikeve rêzê, dikare bi têra dilê xwe bistîne. Bac û lêçûnên wê di nav de ne. Yê ku ji ber tiştî re bibêje "Gulu Gulu Dansî" û piştî xwe bi dadgehên Ewropavoleyê germ bike, bila zêrên xwe bijmêre û simbêlê xwe babide. Ji rewşên bîr û nivîskaran re heta roja "Beranberdanê" bi promasyonan e.

Wekhevî

Di teoriyê de wekî Pîvanên Kopenhagê têtî xuya kirin, lê hebûna wê her tim mîna pratîka OHALê ye. Di qulîs û şevbuhêrkan de navê wê zêde dibore, lê di nav jiyandê de şopa wê peyda nabe. Ajanên kevn, di malperên xwe yê di înternetê de dibêjin ku "Çakicî, Çolajanî, Altaylî û hevalên xwe" ev nav heta 49 salan kirê kiriye. Dema ku wekî tavê di derekê de derkeve jî, ewrên reş derdikevin pêşiyê.

Maîfê Mirovan

Zindiyên ku bêtirs û fikar, bibêje "Maraba Televole.." di nav komarê de serbilind û şanaztir e. Hemû mirov, wekî heşînahiya "Yeşîl" serbixwe û azad in. Yê/a dilê wî/ê bixwaze, dikare li meclîsa azad çend kîlo qanûnên taybet bikire û li OHALê bikeve pey kurdemaçerayên nû, an jî bi teşwîqên xezîneyê, ji bo xizmeta gel diravdankan (ban-qeyan) ava bike û ji herkesî re dibêje "Eee-Kolaaay!!.."

Aştî

Li ser rojnameya Hurriyet û Milliyetê bi 65 milyon quponan ve têtî belavkirin; li gorî şiroveyên qunciknivîsan têtî bikaranîn. Dema ku şaşitîyek an jî faşitîyek çêbe, xwe bi xwe îmhî dik. Cama wekî fitra seriyên belaş jî têtî belavkirin, cama jî mîna pezê ku dikeve piyaseya heywanan. Lê heta niha jî hêza tu kesî negihîştîye ku bikaribe bikire. Yê ku bi reçeteyên cîrana kiribin jî, her dem zir poşman bûne û di ser de jî dest û piyên xwe dane.

Hiqûq

Sûda wê ji Romayê hatibe wergirtin jî, mîmar û babnavê wê "wênesazê hemdem" Kenan Ewren e. Li ser ceyrana Haydar û xortimên Silêman wekî diyarî têtî belavkirin. Ji bo têtî gihîştina wê, cama hinek mirov ji "rûtînê" derdikevin û li welatên cîran operasyonan li dar dixin, cama rewşên bîran di kurterîyên otelan de bi rê dikin bihustê, cama jî li kolanên çepgirîyan guleyan dibarînin. Lê her tişt bo şerefa Televolê û reyting û pêşketina wê ye.

Biratî

Di komarê de biratî li ser felefeya "bira bira ye kurdî cuda ye" hatiye avakirin. Her kes wekî Çatli û Agca bira ye; ermenî, bolcî û Ezraîl jî nikarin nakolî û nexweşîyan derxin û vê biratîyê xira bikin. Carîna hinek "Qamyon û mercedes" hay ji frênen xwe nabin jî, di derbarê wan de doz têne vekirin û tevdirên nû têne standin. "Kew Çetîn" jî ber girêdana papyon û qravatê, "Kek Mahso" jî ji ber klama biratîyê, wekî serokbira hatine hilbijartin. (Bijî birayên ku di kadîna Apê Mûsa de gihîştine hev!..)

Girtîgeh

Di komarê de tiştêkî wisa tune ye. Ew qesrên ku hinek "fesad" jê re dibêjin girtîgeh, ji bo helbestvan û nivîskaran hatine çêkirin, da ku berhemên baştir biafirînin. Spêkûlasyonên "Tîpa F" jî komploya Gunter Grass e, da ku xelata Nobelê ya îsal jî ew wergire. (yemezler!..)

EVDILA KOÇER

MIN SAR E ÇAVÊ XWE NEGIRE!..

ERTUĞ SÖNMEZ



ELESTELIS

SEFER SEVI



TABLÊTÊN

ABÊ, TE MEASA QEŞMER Û BAGI BARDÊ XWE ZÊDE KIR, LÊ QIVAXEK JI MIN RE NEKIR!.. QEY EZ BIRAYÊ PÎÇIM!..

KAT RAK SAM PIŞT HER JI PRE



HOPANÊ MOPANÊ, KE

ZAROKÊN HÊJA YÊN TIRAL Û NETEBAT, PÎNE VÊ QEVDA ZARGOTINA KURDÎ DIYA DIBISTANÊ, ÊDÎ WAN BIXWÎNIN!.. DE ÇA

Yekê yekanakê
Gula çepê, çepilmijê
Xana gijê
Rojê îne
Ser mizgînê
Liba tirî, vegindirî
Çam û çe ye, qulqule ye
Bîst û yekê min li te ye
*

Yekê yekê çavbelekê
Gula çepê, çepilmijê
Aragijê
Tak rihanê li ber baranê
Şox û şanê
Lîska me ye
Bîst li te ye
*

Tîto tîto
Berxa wîto
Bêaqilo
Ket nav çilo
Semikulo
Çarçaqilo
Tîto firiya
Ket nav diriya
*

Xeto banî banî
Bizina reşgozanî

Gundekî tev de x
Li ser xanî billbil
Elo yekî serkul e
Tev bi şingîn e
Elo şûr danî ji mi
Hawar kire Mûsil
Mûsil elba-elba
Çûm çola Mîrme
Bizin banî banî
Qedre mêro niza
*

Hopanê mopanê
Keziya min û par
Avêtin gola hanê
Gola han qamîş e
Kekê min çawîş e
Çawîşê biçûk e
Me jê re anî bûk
Bûka Hesê begê
Şiva ser kokelê
Wê şivê dertînim
Li quncê datînim
Kevokê tê de dat
*

Yek û yek
Teyrê belek
Awaza bilbil
Dermanê dil

ŞI DESTÊ XWE JI SER PIŞTA MIN
 DZNEŞEWPIYO!.. KURO EV ÇI
 İYET E!.. Ê KU İRO DEST BIANEJE
 MIN, WÊ SIBÊ BI NANÊ MIN BİLİZE!!
 HASEBEYÊ HINEK ZÊRAN BİSTÎNE Û
 ROSÊ NÎV KÎLO HINGN Û YEKJÎ
 WATÎFEKÎ BİKIRE!... VAYE SEKÊ
 MEHEKÊ YE ME QALÎÇEYA
 WÊ İHMAL KIRINE!..ZÛ WERE,
 BELA XWE DI
 KESÎ NEDE!..



HEŞ • BAOÛ

imam cici



NÊLA! HEŞ ŞIVANÊ REMNA HA!..
 ÇNÊDO WINAYÎN NÊVÎNYAYO!..
 KAVIR BIRAMNAYÊ
 MIN FAM KERDÊ!..



TEMAM RINDO! GÎŞTA
 XO QULIK SEKNI Û
 PUF BIKE... BENO...



NÊLA!..YANÊ NIKÂ HEŞ BİLÛR
 CENAYÎN MÛSÊ!.. NÊLA! EKE
 DAHOL BIYAYÊ MIN FAM
 KERDÊ!..



FIYA MIN Û PANÊ...

YE DIBISTAN DÎSA VEDIBINI!
 WE DIKE. LI BAXÇE Û HER DERÊ
 MIN, EM BILIKÊ WE BIXWIN!..

Şekir û şema
 Li ber çema
 Çem miçiqî
 Av tê nema
 Ez kuncî
 Em li ser tahtê man biricî
 Ez firiyam, tu ma li cî.

- ***
- 1- Sil û sêvek li kês
 - Sêv gindirî min sêv xwar
 - Sil gindirî min sêv xwar
 - 2- Çêçikê û kûçik di malê de
 - Çêçik firiya min çêçik xwar
 - Kûçik reviya min çêçik xwar
 - 3- Destê min heta enîşkê
 - Ket qunca xurca xwişkê
 - 4- Min sê çar mişar sîr
 - çandin
 - Min sê çar mişar sîr çandin
 - 5- Rê li rê, rovî li rê
 - Rê li rê, rovî li rê
 - 6- Dev li meşkê
 - Meşk li teşkê
 - Kilkila dengê meşkê

Peqpeqoqên Avê

Murat Aslan



Sir
Şev
Rastî
Şikeft
Nexweşî
Ka em li
hêviya hin
tiştan
nasekinin
yek ji em li ber
wê dikevin.
Qefilîn
xewn
şerm
rajêrtirîn
memikên te
gipgilover

"Derewîniya min te rastî nake."
Dinya berevajî dibû. Ger tu bi persivê (grîb)
biketa, wê çelengiya te bigihîsta serî. Ger tu
nebûyayî: Minê bigota, hilma te ji pirtûkeke pîroz
ya tozdar, tarî û hêrsok hatiye dizîn; hatiye
dizîn û bêdirûvkirin... Tarî...Demdemî...
Ger tu çivîkek bûyayî, ezê ber bi derve, ba bi ba
di çavên de biriziyama. Çivîkek, wekî tu ji xwe hez
bikî xweşik. Nikulê wê darîn... dema diqêkê qêrînê pê
dikeve... Bêyî ku tu bihingivê, difire; tim û tim bi
tenê...

Mîna bilindahiyêke dema ku tu li daregûzêke bilind dinêrî, peyda dibe ye. Hê ji şa dibim, dema bavê
min tê bîra min. Bavê min mîna ku li kûrahiyêke pirreng digere, ez mezin kirim. Ger tu xwezî bipirî, va
ye li wir rûniştîye.
Nêrênê wî li kêfxweşiyêke ne bextewar aliqîne. Mîna kelogirîna zarokan...



Zulfinaz, çî keçikeke başîk e... Ez
kengê tême gundê Mala Tajdîn ewê
zînê hespê min digire. Ezê wê ji kurikê
xwe re bixwazim.

Tiştê ku tu nabînî... Nehênîya Jiyane (yaşamin siri): tik û
tenê, miştê şê û jan... Tiştêk heye, her tiştî tîjî ye... Ger
tu hîmî nehênîya jiyane bibî, tu ji jî kerban bimirî...

Nivîsîna çirokekê, razayandina (doğurt-
mak) qêrînekê ye. A ku doza bihîstina wê
tê kirin... Ne ya ku vediguhere zarokêkî/
(mîna pêkan) an jî alîkariya dixwazel... Qet
nel... Qêrînekê... Hema... Ji bo ku wê qêrînê ji
ranezayînê bifiltîne...

Divê keça min tîrê û xweşî bijî... Mîsal, divê zewaceke bêdil neke...
Divê fêrî jiyane bibe; bi ZANABÛNÊ, bi hunerê... divê fêrî bibe...
Jixwe dema zanabûna me geş bû, em bi kurdayetiya xwe hesiyân.
Divê ez bişînim dibistana mecanî; ya herî hindik xirab e, ev el..



Bayekî hemû bûnewerî didêra... Get
nebe di ewran de çikyayî... Rûbarek
hemû giraniyan hildike û dibe.

Jiyane, mistdana birîna
ku divê bê xurandin e...
Jiyane, ku serdanpê li ser
lêvê xuya dibe- jixwe
hezkirineke: şêrî û
sivik...

Niha jî heye, ez pê nizamim, di nava xwendekarên dibistanên
mecanî de adetêk hebû: Dema navê nasekî wê hîn dibûn, bi wî
navî gazî we dikirin û tinazê xwe bi we dikirin. Ger navê diya
yekî Şekirnaz bûya, hemû zarok li dora wî diçivyan û digotin:
Şekirnaz... Şekirnaz...

Mamosteyan tomarnameyên xwendekarên (dğrenci kütükleri), bi xwen-
dekarên ku nivîsa wan xweşik bû, dida nivîsandin. Ji bo hîmî navê dê û bavê
xwendekarên din be, her kesî dixwest nivîsa wî xweşik be. Ma me çîma bi
navê wan henekê xwe dikir? Ez bawer im, wê demê jî, me ji ber wan şerm
dikir...
Xweşnivîsandin bûbû serdestî û desthilatdarî.

Ka bisekinel ku ez hîmî navê diya
te bibim, ezê bikutimêl...

Va ye dêna xwe bi dî, navê bavê
Sîlhedîn Miraz e. Yê Fêwzî Mihemed e,
yê Fêrxo Mistefa ye... Yan hemûyan li
cihekî cihê binivîse, dema gotinê me
nekin, emê bêjine hevalên din jî.

Kuro em ôdevê (sparte) xwe bi
wan bidin çêkirinê... Goreyê
xwe jî bi wan bidin şuştin...

RAWESTE... AMA DE BE!

Revhat Arslan



QAWIŞ
ŞIYAR BE!..

Qozilqurt G kerati! Disa "leşkeriyê veşari" dest
pê kir! Wê "fermandarên şermoke" mîmoste, me
"kedi" bikin. Û lê û bavên me Ji, Ji bo ku kompleksên
xwe tîr bikin, wê êlikariyê wê
bikin!..

PÊDEMÎZTINO!

DIBISTAN, zêrokên çavtirsandî dikin. Û
nêhê lin zêrok zû û bês hîn bibin. Mâ
qimû zêrok listikên zû hîn dibin! Hemû
zêrok Jîr in! Dewlet, tîstên di xwêze
hînî şagirtan dîke, ne tîstên pêwîst!

Di bîstan, dêrên dewletê, mîmoste Ji
keşeyên wê ne. Dema tu bédengûmêsin
bî, tu "baqilû jîr"î! Dema tu li gorî da-
xwêz û pêwîstiyên dewletê bimesî,
tu serketiyî!.. Dema tu "kedi"
nebî, li gorî pergâlû sistemê
nemese, tu ser- neketî û fêmkorî.
Tu Ji bi wê bawer dikî û
xwe biçûk di- bînî!.. Ji bîr
neke, EDISON û EINSTEIN Ji
dibîstane avêtibûn!..


Her gend, ji te kiri tu azad û serbestî,
lê hiş û mejiyê te, girêdayî "ortêşekê" ye!
Û her roj tu wekî mihan tê qêrandin!..


Tu carna "dîni" û tîstên ji adetê der
diki, lê ew ji sistematîk in!.. Tu li dijî
dewletê yî, lê gava tu fersenda dibînî,
tu Ji dîbî dewlet!.. Tu pirtûkên xwe wekî
çetêkê dijgerîni, bîyî ku bi qezencê
zerarên wê bizanîbi!..

Û her roj, tu ber bi hemân âliyê ve diçî, bîyî ku
bi pêş bikevî! Destêrê sistemê te dihêre!..

KLİK!

Dîqet! RAWESTE, AMA DE BE!..
BIXWÎNE! JI BO DEWLETA MEZIN
Û DÎLOYAN BIXWÎNE!..





ÛRO ROJA AŞTÎNÊ YE.



HELWEST Û NÊZIKTÊ DAYINEKE NÛ PÊWÛSTE!..




NE BÊHTIR MIROVANE...



HÊ BÊHTIR DILOVAN...



BONIMÛNE WISA!..



NIMÊJGEHA XEWNÊ

Pencereya Peyvê



EHMED HUSEYNÎ

Dîsa bendergehên xemgîn ên giyanê min, pêşwaziya pêlên kenê te û dilsojiya berbejn û bazbendên bejna te dikin.

Dîsa pencereyên şîngir ên dilê min, pêşwaziya tîrêjên hetava peyvên te û serava çolistana zuha ya gazinên te dikin.

Dîsa gulên xewnê rengên xwe ji lêvên te, bîna xwe ji sêvên te, didizin.

Dîsa zîvên gerdena Zînê, di şemala gerdena rojçêbûna te de, di helkehelka raz û nehênîyên dûrbûna te de, dirizin.

Dîsa şewatên ferhenga bîra min, "serxet" û tirsegavên bêrîkirina dapîra min, sertaca Amûdê ji bo rondikên xatirxwestinê hildibijêrin.

Dîsa bendên axê, bîna rîhana destê te û pirtûka êşa stêrkên sînga te, çîroka aferîdeyên ji tozê, ji miriyên xoşewîst re, dibêjin.

Dîsa hineya porê te, di asoyên sersomiya min de, sawa şevistanê ji bîr dike.

Dîsa bişkojên bişirîna te; ji nişkê ve nemebarana nêrîna te, paytexta seferê pîr dike.

Dîsa wek dara hinarê ya ji westana dayika min, li xuşîna rûpelên zimanê te digirim.

Dîsa wek çûkên destê sibê, li ser şaxên metirsiya te, di bêhûdeyiya navê xwe de, radiperim.

Dîsa zingîna zencîran pêşkêşî semageriya tozê dikim.

Dîsa leşkerên pêxêra dîroka te radestî xencera dozê dikim.

Dîsa xweliya dengên xwe û bêzariya rengên xwe û giryana cengên xwe li ber lingên te radixînim.

Dîsa çira hevdtîna mişextên mirî, bi dudiliya duryan û bi kêlîkên velerzînê, bi nehvirînê, dişikînim.

Dîsa di kaviên xwîna xwe ya windayî de di wêrana birîna xwe ya rîzyayî de di dûmana axîna xwe ya serberdayî de qeqeba kewên te, desthilata dewê te, êşa berberoya te dikişînim.

Dîsa piştî xwe didim dilovaniya ava te û berê xwe didim reştava te û bîranînên reşekonan bi melhêbên girî didêrim.

Dîsa

Wek çavkaniyeke kûvî, ji keservedana te der diçim û di zeviyên matmayîna te, di sirûdên zayîna te de, diçêrim.

namedank!



SEVEN TIRŞ...HIRMIYÊN BAŞ...

KNK'ê di nava ken rûkeniyekê de civîna xwe ya duyemîn li Belçikayê li gundê Bîlzenê, ku bi fêkiyên xwe ve bi navûdeng e, pêk anî. Endamên KNK'ê ew qas tijî bûn ku yê ku ji bo axaftinê dihate ber kursiyê bi zor û kutek ango bi paldanê dihate xwarê.

Lê dem derbas dibû... Di dema axaftina wezîrê aborî yê birêz de serokê dîwanê Mûsa Qewal bi dengê bilind got: "Em niha navberekê didin!" Hema endam bi hev re derketin derve.

Dinya xweş bû, tav geş bû. Dar darên bihuştê bûn, himî, sêv, bindeq û gûzan ji dûr ve xuya dikir...

Ma ku kurd li ser daran fêkiyan bibînin, qet disekinî!

Lê belê rewş cuda bû, ev der Ewropa bû û dîsa ew jî endamên KNK'ê li ser çiqilên darên Bîlzenê bûn; dar talan dikirin.

Birêz Medenî Ferho li ser dara gûzê bû û digot: "Welleh wekî gûzên toriyan in!"

Endamê KNK'ê Nadir Nadirov, ku ji Rusyayê hatibû, li ser çiqila darê hirmiyê bû û hirmiyên ji darê jêdikin, diavêtin xwarê. Li binê darê jî Şerîf Eşîrî pêsîra ceketê xwe ya kincên taxîma ku ji bo civînê li xwe kiribû vekiribû û hirmî digirtin.

Baş e, kê xwe li binê darê çamê veşartibû?

Haya wan jê tune ye lê ez pê dizanim. Ekîba Sêla Sor di nava heyecanekê de ve bûyerê ji destpêkê de dikişîne. Lê mixabin ve yekê zêde nedomand.

Memo endamê KNK'ê, ku li gundê wan darên fêkiyan kêmin, dara çamê şibande dara porteqalê û ber bi wê çû, ekîba Sêlê deşîfre bû.

Paşê bazariyê dest pê kir, tu kesî nedixwest di televîzyonê de were pêşkêşkirin. Pirsgirêk ji aliyê Fetma Dîkmen ve hate çareser kirin.

Di dawiyê de ekîba Sêla Sor bi sêlikek mişt hirmî razî bû û kaset li wê derê, di bin agirê sêlê de hate şewitandin.

Belê, civîn dîsa dest pê dike...

Birêz Musa Qewal, dîsa bang li endaman kir...Heta endamanê li ser darên fêkiyan hatin xwarê, wext derbas bû û wan 45 deqîqeyan dereng dest bi rûniştina xwe ya duyem kir.

Li rûniştina ewil ji ber axaftinê kesî dor nedida kesî, lê li rûniştina duyemîn, kesî mafê axaftinê nedixwest û ji mirçemirça devên endaman pêvetir deng nedihat; fêkiyên ku xistibûn bêrîkên xwe dixwarin.

Ji ber ve yekê serokê dîwanê 10 deqîqe bi şertê ku tu kes demekeve derve, navber da û dest avête berîka xwe ya tijî bindeq û gûz. Piştî belavbûnê, masiyên ku di golên li derdorê şatoya ku civînê tê çêdibû, bala endaman kişand, lê zikê hemûyan bûbû meşk û def.

NECATÎ BOZKÛRT

Şaşiye xwe Pîne bikin!..

Birayên delal, di hejmara Pîne ya 16'an, di rûpela pêşîn, di bin semivîsa Pîne de biwêjek yan jî îdyomek heye. We gotiye "Benîştê dînan bi lîtir e!" Gotina bi vî rengî ne rast e. Rastiya ve biwêjê wiha ye:

"benîştê dînan ji lîtirê ye!" Ez fikirim, min ji xwe re got, jixwe tiştêkî me yê temam û rast tune ye, qet nebe ev çend gotinên ku ji me re ji bav û kalan mane, xwaro maro nekin û pê nelîzin. Lewma jî min hewce dît ku ez ve nameyê ji we re binivîsînim.

Ez hêvî dikim ku hûnê ve şaşi û eyba Pîne (bi ya min dema meriv di rûpela pêşî ya Pîneyê de, wek semivîsa duduyan ve gotina kurdan a meşhûr bi vî hawî bibêje eyb e) piştî ve nameya min "Pîne" bikin, ji bo ku careke din dubare nebe.

Di kar û barê we de ji we re serkeftinê dixwazim û bimînin di xweşiyê de

ZINARÊ XAMO

Tinazê xwe bi Teyran nekin

Pîneçîno der barê babetekê de ez gilfdar im. Di rûpela Xêzên Beredayî de tinaz bi Feqiyê Teyran tê kirin. Mebesta ve rûpelê tinaz bi Feqiyê Teyran kirin e. Lê belê Feqiyê Teyran mirovekî oldar e û helbestên wî giş li ser jiyana manewî ne. Ev zat di nava kurdan de bi çî awayî tê naskirin, divê hûn baş zanibin: Wekî zatekî alim, oldar hwd. pêwîst e hûn van tiştan-bidin ber çavan û xêzkar xêzên xwe rast xêz bikin. Bimînin di nava xweşiyê de...

CÎHANGÎR

WERIN QERFAN!..

- Xaltîkê tu kîjan taximê digirî?
Fenerbahçe, Xalatasaray an jî Beşiktaşê?
- Ji wan taximan kîjan misilman be, ez wê digirim!..

Melkemot te ji bîr bike.

Di mala we de tûp biteqe.

Xwedê bike tu li teyarê siwar nebî.

Xwedê bike mûyê çoka te spî bin.

Bi çaydanê (misînê) pêxember.

- Bavo ez dixwazim hînî nimêjê bibim.

- Kurê min tu dizanî fatîha û ettehyatê xwe?

- Na bavo!..

- Tu zarok î, ji te re ne ferz e!..

Hema wisa bêje bes e: 'Darê min kulavê min, rehmet li dê û bavê min.'

- Evarê were mala me.

- Na, ez nayê.


- Çima gelo?

- Ez ji kûçikê kolana we ditirsim.

- Bi rastî ew pir dijwar in, lê tu guh bide min: Dema kûçik beziyane te, wê gavê ku cilê ji xwe bikî û çîp tazî biminî, ewê dev ji te berdin, nayên te.

- Baş e. Ku ez wisa bikim wê dergistiya min Fatê jî dev ji min berde!..

EVDİREHMAN PİRHEJA



ZAROKNO! MİRZE MIHEMED BI HAWARA WE VE HAT!

DÊ Û BAVÊN ZANA!..

Çîrok mamosteyê herî hêja û xwînsêrîn e!

Zarokên xwe bi çîrokên kurdî razînin!

Tatîl bi çîrokan xweş û geş e!

ZAROKÊN NO Û NETEBAT!..

Guhê dê û bavên xwe qul bikin, pirtûka we derket!

Mîrze Mihemed zora Hîmen jî zora Pokemonan jî dibe!

WEŞANÊN WELAT

Ji belavkarên Azadiya Welat û Pîneyê bixwazin.

Tel: (0-212) 251 90 13, 251 79 37 – Fax: (0-212) 251 95 85

Welat derket



Li hemû bayiyan e.

Kovara panzderojî (Onbeşgünlük Dergi)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi) **M. Nuri Karakoyun**
■ Lijneya Weşanê (Yayın Kurulu):
Mazlûm Doğan, Doğan Güzel, İmam Cici

■ Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
■ (Yazı İşleri Müdürü) **Abdurrahman Pekedis**
■ Navnîşan (Yönetim Yeri) **İstiklal Cad. Ayhan**
Işık sokak.19/1 Beyoğlu/ İstanbul

■ Tel: (212) 292 72 70
■ Fax: (212) 251 95 85
■ E-Mail: pinedank@hotmail.com

■ Kargerî (Idare) (212) 251 79 37
■ Çapxane: **Aspaş Matbaacılık.**

■ Yayın Koordinasyon
Ada Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd.Şti.

■ Belavkîrin **BİRYAY** Dağıtım
■ Nûnergeh: Edene: (322) 351 42 78
■ İzmîr: (232) 446 19 50 Mersin: (324) 237 66 49



BEQ Ên destê sibê hatine dinyê



Rûpûşa we ket. Ji emrê we re çar tirên kerê maye. Vir û xapînokên we derketin holê û hindik maye ku di kovar û rojnameyan de derkevin. Wekî Ecevîto û hevkarên wî, êdî hûn nikarin der barê hinekan de biryarmeyan derxin û dest bi jîneke nû bikin, an jî em pînedoz jî êdî nikarin we xelas bikin.

QUŞXANE Ên berî nîvro...



Em dizanin hûn jî aştîxwaz in û wekhevîyê diparêzin. Lê hîna jî hûn wekî şêxê gundê me, ji xwe re li mûrîdan digerin û çavên we li nanê wan e. Hûn li dijî feodalîzmê ne jî. Lê piştî vê sedsalê jî we hîna divê ku hûn bibin serekê eşîkekê û wekî hêzên Hîtler erîşî derekê bikin.

MOZ Ên piştî dana pez



Piştî ew qas keda malbatê, dîsa we zanîgeh kar nekir û hûn nebûn destbivîrek jî. Ma em êdî çî jî bibêjin, wê di guhekî we de here û xwedê dizane wê di ku dera we re derkeve!.. (Nifiran nekin kuro!..) Êdî rawestgeha we bûye qehwexane û êdî hûn bi şev jî li wir radikevin (Kîş û mat!..)

CASIK Ên ber êvarê...



Îsal hûnê ji kar bèn avêtin û sala ku bê, hûnê herin zozanên Herekolê û bibin şivan. Li ber pez hûnê pirtûkên polîtîk bixwînin û hîni pir tiştan bibin. Dema ku hûn ji koçeran re qala lîberalîzm û globalîzmê bikin, dê we bidin ber gopalan û hûnê bê pere vegehin mala xwe. Heta çend mehan hûnê li ser "yoginlaşmış" bibin û xeletiya xwe fêhm bikin.

ZIRNE Ên nivê şevê...



Bîneranî xoşewîst! Ji hinek gotinên sebaran hûnê aciz bibin û fêrî zimanê kurdî bibin. Dûvre hûnê malbat û hevalên xwe fêrî kurdî bikin. Dawiyê jî cîranên xwe bikin. Ew jî dê fêrî cîranê xwe bikin. Rojêkê hûnê bibînin ku, hêrsa we bi kêrî tiştêkî hatiye. (Bijî gotinên sebaran!..)

HUDHUDK Ên heft mehî hatine...



Ji bo lêkolîna nifir, pasgotin, derew, sixêf û dijûnên kurdî hûnê bi hevalên xwe re komeleyekê ava bikin. Sponsorê wê jî dê qalpazanên Bazîd û Qoserê bin. Di nav şes mehan de hûnê şoreşeke pêk bînin û ferhenga wan a kurdî-tirkî çap bikin. Ya pêşî jî hûnê diyarî meclîsa Enqereyê bikin.

Mujde Mujde!..

KNK NIVIŞTA YEKÎTIYÊ ÇÊDIKE!..

BRUSSEL/KUNDIRPRES- Wekî ku tê zanîn bav û kalên me dibêjin "Çi tê serê kurdan, jixwelîseriya wan tê!" Yanê ji bêaqûbetî û perçebûna wan tê. Piştî ku KNK li Brukselê li ser yekîtiya neteweyî civinek çêkir, di warê hev-girtin û bihevzeliqandina neteweyîya kurd de hin rewşên xoşbîn û pozîtîf pêk hatin. Di kongreyê de gelek dîtînen balkêş derketin holê: Muxabîrê Kundirpressê li guftûgoyan temaşe kir. Va ye em ji we re zebîtên guftûgoyan pêşkêş dikin:

Musa Beg-Colamêrg: Em herin fabrikeyên belçîkî, belkî ji bo ku em hev bigirin û cardin bemedin, zamqekê an jî şîrêzekê çêkin.


Kak Hîzedîn-Sulêmanî: Na kaka ne maqûl e, ligel me tir-beyek heye, em herin wê derê qurbanekê ser jê bikin.

Husên Qertel-Berfîn: Gelf hevalan, ev der sazîyêke zanistî û ilmî ye, divê tiştên zanistî...

Zubêr Axa-Sêrt: Hiş bin, bila kes dengê xwe neke!.. Li vir demokrasî heye, kî çî dixwaze dikare bêje...

Kek Keya-Serhed: Ane gorî dîtina min, ji bo em vê meseleyê biaxîfin, em hemû partiyên kom bikin û xwarineke neteweyî çêkin...

Stratejîst Selîm-Warto: Ez piştigirîya Kek Keya dikim. Stratejiya me kême û ew jî ancax li restorant û kulîsan tê



danîn. Divê em dîplomatan bixapînin!..

Refîk Nebîl-Qamîso: Ez bi serê wî sond dixwim ku...

Nenas: Hiş heval, tu çî dibêjî!..

Refîk Nebîl-Qamîso: Yanê bi serê mürşîdê Rojhilata Navîn...

Mehmûd Abê-Amed: Li Danîmarkayê min li ser vê meseleya yekîtiyê broşûrekê pir biçuk, bi qasî 1700 rûpelan amade kiribû, ez dixwazim wê bixwînim!..

Prof. Gelek Şerîf-Serokê KNK: Angebot yanê pêşniyaza Kek Mahmûd hate qebûlîkirin, di civîna piştî deh salên din de, birêz Mehmûd wê karibe nivîsa xwe ya kurt bixwîne!..

Mele Nîzam-Batman: Gelf hevalan, bi qasî ku ez dibînim, bi vî awayî tu tişt naçe serî. Ji bo vê yekê pêşniyazêke min heye. Em di nav hev de pere top bikin û herin Erebestanê, paşê em herin Watîkanê, ji wir herin Lalesê, paşê herin Qudsê û em nivîstekê çêkin, bavêjin nav Çemê Dîjleyê. Ger ku kurd di nava mehekê de nebûn yek, ez jî tiştêkî nizanîm!..

Evdile Dirêj-Bilîs: Em peryê ku top bikin, wekî bertîl û ruşwet li partiyên xwe belav bikin, wê ne baştir bel!..

Prof. Gelek Şerîf-Serok: Gelf hevalan ez 80 salî me. Tiştêkî ku min nedîtiye nema. Îca jî emê pêşniyaza Mele Nîzam pêk bînin û nivîsta xwe çêkin, xwedê mezin e!..

Cengîzhan Alp-Partiya Tirkmen: Ya tutarsa!

EMOŞ NE XOŞ!..

Rêxistina IPI yanê Rojnamegerên Navneteweyî birqeyekê li dar dixê. Ji Tirkîyeyê rojnamegerê navdar û har Emoş tevî vê birqeyê dibe. Ji Kurdistanê Mehmûd Baksî jî wekî çavdêr di jûriya birqê de cih girtiye. Jûrî kerekê (manker) dide her rojnamegerê ku tevî birqeyê dibe. Rojnamegera zîrek û jîr, divê di nava şes mehan de vê kerê zêde bike û bîne. Kî çiqas li kera xwe çêlikan yanê cahşikan zêde bike, ewê xelatê bigire.

Çavên hemû dinyayê li ser vê xelatê ye. Bi taybetî rojname û tv'yên komara demokratîk pesnê Emoş didin û dibêjin, "hêza me ya mîlî li piştî te ye. Tu bedelê hemû cîhanê yî û filan û bêvan." Her roj hêkerûn û qelî û hingiv û gûzan didin Emoş, da ku piştî wî quwetê bigire.

Piştî şes mehê din, jûrî cardin dicive û rojnameger hêdî hêdî tîn. Ê rûsî tevî kera xwe şes çêlikan, yê îngîlîz 4 çêlik, ê emerîkî û elman 3 çêlikan tîne. Herî dawî Emoşê me tê. Lê wî tenê çêlikêk li kera xwe zêde kiriye. Hemî hevalên wî jê dipirsin: "Xwelîsêro te em rezîl kirin!.. Ka qehremanî û cengewariya te!.. Ereb û farisan jî du çêlik anîn, te yek anîye, ew çî îş e!.. Emoş bi hêrs dibêje: "Komplo li serê min, gerandine!.. Ezê bavê wan bişewitînin... Ezê wan bidim DGM'ê. Kera ku dane min nêr derket!.."

Ji dût ve dengê Mehmûd Baksî tê: Emoş ne xoş!

KUNDIRFÎTÎ

- Hûn li ser min binivîsînin, ezê we bihetikînim. *Gulistan Perwer*
- Em li nasnameya xwe digerin. *HADEP*
- Ez ne serokkomarê Mehmûd Baksî û Yaşar Kaya me. *Ahmet Necdet Sezer*
- Ez li pisîkekê digirim. *Kemal Bûrkay*
- Ez pirtûkekê dinivîsînim, ji ber vê yekê min aciz nekin. *Xwişka Cîncî*
- Min hê jî ji xwe re asîstaneke/e bêaqil peyda nekiriye. *Cahît Merwan*
- Me li ser rewşenbîrên mehmetçîk ên demokratîk nivîsand, Pîne jî neweşand. Yanê me acizî da wan. Ji ber vê yekê em xwe protesto dikin. *Kundir*
- Ez jî Kundir protesto dikim. *Mam Celal*
- Ez jî Kundir protesto dikim. Waliyê OHAL'ê
- Biz de Kundir adlî provakator mecmuayî şidetle protesto ediyoruz. *Feridun Çelik*
- Ez jî Kundir gelek hez dikim. *Cahît Merwan*
- Em jî kê gelek ji Kundir hez dikim. *Medeni Ferho û eşîra Tora Hevêrkan*
- Ez li TV'yekê digirim ku bemameyan çêbikim. *Seyda Dilbirîn*
- Em li çêrbêjan digerin. *Interkerxane Patron Fexo*
- Ez digirim li vê dinê, sebra dilê xwe nabînim. Li wî alî tunebe gelo? *Beytocan*
- Em Mehmûd Onder pîroz dikin. Êdî di saziya herî bilind de berdevkê me ye. Piştî me êdî ne li erdê ye. *Rojnamegerên Kurd*
- Li konferansan digirim. *Salah Bedredin*
- Em jî bi 10 hêzar dolaran konserên siyasî didin. *Xwişka Ezîza Qedirî Koma Mûsikî Zamhetkaran/ Sulêmanî*
- Kuro Emoş, zebesîroş, tu mêr bî, were ber beros. *Mehmûd Beksî*



MAMOSTE
EZ ZANIM
...

EZ JÎ!..

MAMOSTE
EZ!..

EZ!..

EZ JÎ!..

LAWO QI
QEWIMIYE LI VIR?..
VAN BERÊ TILIYA XWE
WISA RANEDIKIR...